



Schleswig-Holstein
Ministerium für Justiz,
Europa, Verbraucherschutz
und Gleichstellung

Tené bi cesaretbin!

Derfetén kiryâren jinan,
yén péywendîyé xwede şideté dibînin



Schleswig-Holstein. Der echte Norden

KIK
netzwerk
bei häuslicher gewalt

AGAH DARİYÊN ÇAPENÎYÊ DÛSSELDORFÊ

AGAH DARİYÊN ÇAPENÎYÊ HEZİRANÊ

Weşandvan:

Ministerin für Justiz, Europa, Verbraucherschutz und Gleichstellung des Landes Schleswig-Holstein
(Wezîra jibona dadmendîyê, Ewrûpa, parazbûna çikyanîyan û wekhevîyê ya Eyaleta Schleswig-Holstein'ê)
Lorentzendamm 35
24103 Kiel

KIK Schleswig-Holstein
Kooperations- und Interventionskonzept gegen häusliche Gewalt des Landes Schleswig-Holstein
(Konseptê hevkarî û mûdehala dijê şîdeta li malê ya Eyaleta Schleswig-Holstein'ê)

Hatîye pêkanîn ji alîyê:

freistil mediendesign, Kronshagen Wêne: Photocase.com
Wêna Vezîr: Conny Fehre Druck: Baskî: LWK Ratjen, Kiel
Ev broşûra agahdarîyê lîser bingeha broşûre kû ji alîyê sazîya şewirmendîya jinan li Düsseldorf'ê (Frauenberatungsstelle) e.V. bi navê „tenê bi cesaretbin“ derfetên kiryarên jinan, yê di pêwendîyên xwede şîdetê dibînin, hatîye çapkirin û nav û naverûka vê broşûre bi destûra dostanî ya sazîya pişgirtîya jinan li Düsseldorf'ê e.V. tê pêkanîn.

ISSN 0935-4379

Çapa 4.

Hezîran 2018

Malpera Internetê ya hûkmeta Eyaletê:
www.landesregierung.schleswig-holstein.de

Ev broşûr bi kaxeza kû şûnde tê kezeç kirin, hatîye çap kirin.
Ev pirtûk ji alîyê hûkmeta Eyaleta Schleswig-Holstein'ê di navbera xebata agahdarkirina gelemperî hatîye çap kirin.
Qedexeye kû ev pirtûk ji alîyê partî û şexsên kû kampanyên hîlbijartinê dimeşînin, anjî kesên piştgirtîyan wan dikin, werê bi kâranîn. Ev pirtûk hîlbijartina ji niha péde werê çekirin, kû kengê werê çekirin ne girîngê, nikarê ûsa werê bi kâranîn kû, ev ji qencîya hinek grûba di meclîsa Eyaletê'de werê fêhm kirin. Partî dikârin vê pirtûkê jibona agahdarkirina endamên xwe bi kârbînin.



Xwendevanên bi rûmet!

Şîdeta kû di malde té jîyandin, mixabin héjî bûyerik gelek belavé. Heké we jî şîdet ji alîyê havalé xwe dîtîbé, li we hatîbé xistin, hûn hati-bin rezîlandin, ji were heqaret hatîbé kirin jî û îca hûn dixwazin jîyana xwe bigûhrin, ev broşûr di van rewşande ji were agahdarîyên bi feyde didé. Bi vé broşûré hûn dikârîn agahdar bibîn ku, jibona we çî tedbîrên parastina şaxsî û yén dadgehî hene.

Li Schleswig-Holstein'é di sala 2016 de jibona şîdeta li malé polis 3721 caran çûye cîhên bûyeran. Di encama 550 bûyerande kesén sûçdar ji xanîyé şîrkatîyé hatiné derxistin û dûr kirin. Dîsa sala 2016 de li Schleswig-Holstein'é 1658 jin bi zarokén xwere xwe spartiné xanîyén jinan.

Ev dane û rastîyên he dîyar dikin kû, hûn bi qedera xwe ne tiné dimînîn û jibona rewşa we ya zor û zehmet ne hewceye kû hûn şerm bikîn. Bi saya véde péwîste kû hûn bi héz bibîn, kû da hûn bikârîn bi réyek şaxsî ji péywendîya şîdeté derkevin. Ez bi ewleme kû teşwîk û agahdarîyén kû di vé broşûréde hene wé alîkârîya we bikin, kû da hûn reyek nû peyda bikîn.

Tené bi cesaretbin!

Ez we bi dilovanî silav dikim

Dr. Sabine Sütterlin-Waack

(Wezîra jibona dadmendîyé, Ewrûpa, parazbûna cikyanîyan û wekhevîyé ya Eyaleta Schleswig-Holstein'e)



- Di péywendîyande şîdetê dijê jinan – ev çîye? - 7
- Çi cûdabûnê zor dikê- 9
- Çerxa şîdetê – 10
- Wek jinek penaber pêwîste ez baldana çî bikim? - 12
- Tiştê herî grîng parastine! - 14
- Wek din çî dikêrê min bi parêzê? - 16
- Polis û dadmendî jibo min dikêrin çî bikin? - 20
- Kêrmendên tendûristinê dikêrin jibona min çî bikin? - 26
- Ez dikêrîm qûdê îkame bikim? - 29
- Ezê bi çî jîyan bikim? - 31
- Wê zarokên min çî bikin? - 36
- Ez dijê evîna bê bersiv dikêrim çî bikin? - 39
- Derdûra sosyal dikêrê çî bikê? - 42
- Lîsta kontrolê jibona alîkêrîya tengasîyê û derketina ji malê - 43
- Tembîha dawî - 44
- Pêşnîyarên alîkêrîyê - 45

Di péywendîya şîdeta dijé jinan – ev çîye?

Jin bi şîdeta di péywendîya ji sûçên şîdetén din zédetir tén tehdît kirin. Şîdeta ji aliyé zilam bi şîdeta malé té navdar kirin. Ev şîdet zédeyî „li malé“ çédibé, ango deveré kû péwîste jin xwe ewlekâr bibîné, çédibé. Encama van bûyerande ji kiryanan sedî 90 zilamin û jin ji maxdûrin.

Lékolînén nû eré dikin kû, herî hindik ji çar jinan yek di jiyana xwede di péywendîya xwede careké şîdeta fîzîkî û/anjî cinsîyeté dîtîye.

Li véderé gelek şiklén şîdeté yé fîzîkî, derûnî, cinsîyeté, sosyal û abori tén pékanîn.

Şîdeta nava maléde hemî meylanén sosyal, imir û nijadînde pékté, bi teybetî jî di demé cûdabûné de bêtarîya mezin heye. Zarok jî herdem dibin maxdûrén vé şîdeté!

Di hemberé şer, dûbendî û hevçûyîné armanca şîdeté di malde herdem di tekilîyede pékanîna kontrol û hézéye.

Ev şiklé şîdeta hevaletîyé ne hindek bi nerîna dijminetî ya sûçdar ya dijé jinanve girêdayîye. Şîdeta péywendîyé bi piranî di çerxa çébbûna nakokîyan, dijarbûyî û pûşmanîyé çedibé. Ev gelek caran normal, heta caran bi teybetî bi dilşadî despédiké û té gûtin „tû her tişté minî – ez bé te nikârîm jîyan bikim“. Lé belé di vé péywendîya ne kashevî demik zûde tersa wé dîyar dibé; zilam bi piranî liser jiné kontrolé pék tîné, dûxwazé hemî tiştan bizané, dilreş dibé, her derketina ji dervé malé jére xeter dibé.

Êrîşé bi dev, bizotbûna yekcarî û despékê şîdetén biçûk çédibin, kû hevalé we bi wiha dûxwazé kontrolé bexé desté xwede.

Bandorén ji derve, wek hêrsa liser kâr, hasûdî anjî baré rewşa jîyané, wek berpîrsîyar tén nîşandan. Sûç gelek caran nawen veşartin anjî léborîn nawé xwestin. Jin hewl didin kû, hîsé xwe yén tîrsé, bêçareyî û hêrsa xwe bindest bikin û bi vî rengî hevalé xwe

**Péywendiyéde
jibona şîdeta
liser jina qet
sedem tûne!
Ti sûçé we, heta bi
kémasî jî
tûne!**

**Péwîste tené
sûçdar bersarîya
bûyerén xwe
bistîné serxwe.
Heké ew ne xwazé
vé biké, ji were
tene reyik dimîné
kû, hûn xwe û
zarokén xwe ji
érîşan paşre bi
parézîn.**

mafdar bikin. Ūsa hévî dikin kû, şîdetén din kelem bikin. Lé belé dîsa jî giranîya şîdeté zéde dibé. Birîndarîyén bi xeter û wérankirin çédibin. Piştî wé sûçdar gelek caran bi pûşmanetî léborîna xwe dixwazé, bi teybetî jî afû dixwazé û dîyarîyan didé. Wî demîde qûrban û sûçdar ūsa tevgerr dikin, heçkû tiştek ne kavimîye. Gelek jin hevî dikin kû, „rastîya“ hevalé wan eve û hedî ti êrîş pék navin. Lé belé ev çerxa he nû destpédiké. Şîdet zédetir û xetertir dibé. Jin hertim bi tirs, di barzorîya psîkolojîk û tenemayîna sosyalde dijin. Zilam gelek caran tehdîta kû, evé zaroka jé we bistîné, diké. Ne hêsaniye kû mirov, ji vé rewşa tirs û girédayîne çareké bibîné, lé belé ev mûmkine. Ev broşûr yekser hîtabé maxdû-rén ku, bixwazin xwe agahdar bikin, rasterast diké. Daxwazî ewe kû, ev broşûr cesaret bidé jinan kû, da reyek ya çare-serîya derketina ji rewşa şîdeté bibînin.

Peywendiyéde jibona şîdeta liser jina qet sedem tûne!

**Ti sûçé we, heta bi kémasî jî tûne! Péwîste tené
sûçdar bersarîya bûyerén xwe bistîné serxwe. Heké
ew ne xwazé vé biké, ji were tene reyik dimîné kû,
hûn xwe û zarokén xwe ji érîşan paşre bi parézîn.**

Çi cûdabûné zor diké?

Gelek jin dixwazin péywendî û evîna xwe rizgar bikin. Pêşî çareserîyan digerin û hévî dikin kû „ewé“ anû zilam wé xwe bigûhiré. Naxwazin malbata xwe – bo xatiré zarokan „xira bikin“. Ew ditirsin kû, gava xwe cûda bikin, wé şîdet zéde bibé. Lekolîn îspat dikin kû, demé cûdabûna ji péywendîya kû téde şîdet heyî, demé herî bi xeteré.

Gelek caran derdûra sosyal ji jinanre zehmetîyan dertéxin. Nêrînen ciwakî û pêşbiryar rewşé xiraptir dikin. „Di her zewacéde şer, bihevçûyîn heye“ anjî „jiné zilam har kirîye ...“. Heval, cîran anjî sazî gelek caran péywendîyén téde şîdet heyîn baş nasnakin û kesé maxdûr dibin jî berpîrsîyar dibînin. Şîdeta dijé jinan girîng nabînin, anjî heta rastdar dibînin. Ûsa sûçdarén şîdeté tén parastin û té kelem kirinkû kû, jin alîkârîyé bistînin. Çikas péywendîk ya bi şîdet berdewam biké, awkas jî girêdayî diréj dibé. Hingé jin difikirin kû, ew di rewşa xwede nikarin tiştke bigûhrînin. Hingé bawerîya wan bi xwe û ji derdûré wûnda dibé.

Her cîhé şewirmendîyé vé rewşé nas diké û di rîya kû hûn téde diçine wé alîkârîyé biké!

Dirûvén Şîdeté

Şîdeta Sosyal

Tékilîyê we kontrol anjî qedexe dikê,
we ji kesên din dûr dikê, axaftina we
yên bi telefonê kontrol dikê ...

Di derdûra we ya sosyalde hekareta bi
we dikê, zarok wek hacetên zextê tén
şûxlandin, di cîhê kêrê we de terorê liser
we dikê ...

Şîdeta Fîzîkî

Dehfkirin, léxistin,
pehin léxistin, xeniqandin,
girédan, şawtandin, kelandin,
bi tîştan anjî çekan birîndarkirin
anjî tehdîtkirin...

Şîdeta Psikolojîk

Tirsandin, tewankirdin,
tehdîtkirin, we wek dina dîyarkirin,
we bérûmet û biçûk ditîn...

Şîdeta Cinsîyetê

Tecawûz, we kûtekî tekiîyê
cinsîyetê dikê, we wek hacetik
ya cinsîyetê dibîné, we bi kûtekî
temaşekirina pornoya dikê...



In Anlehnung an das Modell Domestic Abuse Intervention,
Projekt (DAIP) 1983

Şîdeta Aborî

Ji were xebatê qedexe bikê anjî
we kûtekî bidê xebatkirin, pera
nedê we anjî pera bi were pak
nekê, masrafên we kontrol dikê ...

Ev grafîk şanî ditê kû, tevgerên şîdetê çikas berfirehe.
Ev çerçûwa sîstema şîdetê zelal dikê kû, de navenda
wêde pêkanîna hêz û kontrolê liser kesê din heye.

Ev çend salin gelek caran şîdeta dijîtali pêktê. Zilam,
jibona jinê bérûmet, kontrol, tehdît anjî şantaj bikê,
weşanên dijîtal bikâr tînin. Şîfre anjî agahdarîyên
kâranîné jî dikârin werin dizîn. Gelek caran bê zanîna ji-
né programên sixûrîyê tén sazkin. Teknolojî derfet didê
kû, hemî péwendîyên tén meşandin werin berçavkirin,
cîhê kû mirov lê werê zanîn, légerîn werin xwendin û yén
din. Zilamê berê, jibona jinan bi berdewanî kontrol bikin,
tehdît bikin û bitirsînin, sepanan dijîtal ne hindik bikâr
tînin.

Héz û Kontrol

Héz û kontrol di navenda şîdeta dijê jinande cîh digré. Jibona berdewamkirin û çespîna héz û kontrolé, gelek şiklên şîdeté, yén kû dawiyé dibin şîdeta fîzîkî, tén bikâranîn.



Wek jinek penaber p ew iste ez baldana  i bikim?

 ideta di mal  bi reng  f z k    der n , li Almany  t  cezakirin! Ev, hek  jibona zewac  kotek  li we wer  kirin, anj  h n bi sinetkirin  wer n tehd tkirin j  p kt .

Bi sedema asteng y n ziman anj  zagon n b yan yan, s stema al k r y  ji xwe d r nekin. H n dik r n ji c h n  ewirmend ya jinan, mal n jinan   c h n  ewirmend ya penaberan al k r y  bist n n. Xebatk r n van c han mecb r n k  sira ve er n! Pirs  liser, gelo c dab n band rk  liser rew a we ya r ni tin  dik  ane, di axaftinek bi bawer    b gir dan  dik r  wer  zela kirin. Liser daxwaz y  dik r  vergerik wer  waz fedarkirin.

Ev maf n he ji were wek jinek penaber j  hene!

**Péşnîyarén malén jinan, cîhén jibona
şewîrmendîyan jinan, telefona hawaré jibona jinan
û cîhén şewîrmendîyan jinén penaber belaşê!**

**Hûn dikârînin agahdarîyên teklîlîyê di pêvokêde anjî
di nimra**

08000 116016

ya telefona alîkârîyê bistînîn

Hekê zilamê we xirabî we kiribê û hûn despêkê nexwazin tiştê bikî
jî, girînge kû hûn liser wê lédanê ji alîyê doxtorkê raporkê bistînîn.
Çi hatibê serê we dîyar bikin!

Hûn dikârînin birînen xwe, da jibona dadgehê bibê delîl, ji alîyê Univer-
sitätsklinikum (Klînîka Zanîgehê) Schleswig-Holstein (UKSH) anjî
Universitätsklinikum (Klînîka Zanîgehê) Eppendorf (UKE) bi nivîs
bidîn belgekirin.

Ev belgekirina bi zelalî dikârê jibona pêşkêşkirina licem rayedarên
fermî (wek di navbera mada 31 ya zagona liser rûniştinê), anjî jibona
pévajoyek ya dadgehê girîng bê.

**Belgekirina encama birîndarîyê bi lezgînî û gora
rastîyan:**

Universitätsklinikum (Klînîka Zanîgehê) Schleswig-Holstein (UKSH)

Cîh, Kiel: 0431-500 15901

Cîh, Lübeck: 0451-500 15951

anjî Universitätsklinikum (Klînîka Zanîgehê) Eppendorf (UKE)

Cîh, Hamburg: 040-7410 52127

Tiştá herî girîng parastine!



Heké mesele şîdetbé, parastina kesé qûrban tiştá herî girînge. Her tiştá weré çêkirin, anjî nevê çekirin, péwîste kû gora hewcedarîya parastina we bé meşandin. Hûn wek maxdûra yekserî, wek pisporeké dizanîn kû, jibona parastina we çî başe, anjî çî xirabé, ji ber kû tene hûn zilamé xwe nasdikîn û rewşa kû hûn tédene hûn baş dizanîn. Çî tiştá ewlekârîya we zédebiké bikin. Heké hûn tirsîn, wé jidil bigrin. Ev nîşana wéye kû, hûn di bin tehdîtédene. Derfeta we heye kû, hûn seri li cîhek şewirmendîya jinan, ya nîzîké we û ya kû hûn di nava rojéde biçîné, bidin (binérin pévoké). Hûn dikârîn şevan, dawîya haftîyé û rojén betlanîyéde di nimra telefona alîkârîyé 0800 – 0116016 bigerîn. Heké hûn jibona rewşa xwe şîka dikin jî, li vé nimré bigerin. Girînge kû mirov péywendîya téde şîdet heyî, demek zû pé bi hesé.

„Nehén Rakin“

Veşartîya şîdeté ji were ne alîkârîye, ev tene alîkârîya kesé sûçdar diké. Ji gelek jinanre axaftina liser bûyera şîdeté ji alîyé zilamé wan teştik eyb û nexweşe. Heké hûn fedî bikîn, liser şîdeté polîs û dozgeran agahdar bikîn, vé ji kesé kû hûn ji wan bawer dikînre béjin: wek havalé jin/mér, hevalén liser kâr, mirovan anjî cîhé şewirmendîya jinan, anji malek ya jinan (edres di pevoké deye). Hûn dikârîn di mala jinan de bi zarokén xwere şev û roj bimînîn.

Di rewşik ferdî de hûn dikârin biryar bidîn kû, çi raste anjî ne raste. Tene vî rengî hûn dikârîn jîyan û tendûrîstîya xwe û zarokên xwe bi parézîn.

Evê we rehet biké û bi rastî jî parezbûna ve zêdetîr biké. Çikas zêde kes ji şîdeté agahdarbin, ewkas kes dikârin zêde bala xwe bidin we.

Tevdêrên ewlekârîya berbiçav

Ji bilî derfeta kû mirov pêşîya pékanîna şîdeté heré cem kesé kû mirov ji wan bawere, anjî heré mala jinan, jibona parastina we (û zarokên we) dibé kû jibona ewlekârîya we tevdêrên dinjî hebin. Dibé kû ev telefonkirinek ji polîsre, anjî amadekirina „çentek jibona rewşa acîl“ bé (binére rûpela 43 yé)

Jinén maxdûr ji bilî wanjî jibona alîkârîyé van tevdêrên ewlekârîya dîyar dîkin:

- Kesén kû hûn ji wan bawerîn agahdar bikin û ji wan rica bikin kû, caran anjî demé kû xeterî zêde hebé, telefoné ji were bikin, anjî werin cem we
- Rapora/raporén we yén tiba hûqûkî kom bikin
- Herin menzela we ya kû derîyé wé té kilît kirin/menzelik ûsa peyda bikin
- Ji xwere telefonê dest ya ewlekâr bistînin û jibona kû hûn di rewşa acîlde alîkârîyé bixwazîn, herdem amade bikin
- Belge û tiştên girîng jibona we (û zarokên we) bexin di „çenté rewşa acîlde“ û vé deynin cem kesek kû hûn jé bawerîn

Ez xwe wekdin çawa dikarim bi parêzim?

Hûn dikarin ji bilî tevdêrên ewlekârîyên şexsî derfetê hûqûka sivil jî bi kêrhatîn bînîn.

Hûn dikarin bi teybetî wan tiştan bixwazîn:

- **Biryarên ewlekârîyê**
- **Biryara dabeşkirina malê jibona kû hûn tene tede bimînîn**
- **Biryara jibona kû welayet/xweserîkirina mafê cîhmayîna zarokan tene ji were werê dayîn**
- **Hûn dikarin ji dadgehê rakirina/sinirkirina danûstandina bavê zaroka bi zarokanre bixwazîn.**

Herwiha mafê we yê tazmînat û perê eşê jî heye. Biryara pergalên û dabeşkirina malê jibona tenê rûniştinê, tevdêrên zagona parêstinêye. Herkes dikarê feydê ji derfetên zagonê bibînê.

Biryara liser dabeşkirina malê jibona tene rûniştinê

Hûn dikarin mala kû hûn û zilamê we tede hevre dimînan, jibona hûn tene tede rûnîn, bixwazîn kû dewrê we werê kirin. Her çikas hûn ji mala kû hûn tede hevre dimînan, ravîbin jî, derfeta we jibona wê heye. Hûn dikarin piştî bûyerê navbera sé mehanda ji zilamê we (yê berê) bi nivîs devrkirina malê bixwazîn, anjî navbera vî demîde jibona wê serilêdanê licem dadgehê bikîn. Çi dema hûn ji aliyê zilamê xwe (yê berê) şidetê bibînin, hûn dikarin vé serilêdanê bikîn.



Ev, hûn zewicîbin anjî ne zweicîbin, zilamé we (yé beré) bi seré xwe tené, anjî we herdû peymaná kiré emze kiribé jî, anjî mal ya hevale we, anjî ya we tenebé jî, pékté. Heké tene hûn kirédar, anjî xwedîyé malébîn, hingé dabeşkirina malé bédome. Heké hûn ne kirédarbîn, anjî ne xwedîyé malebîn, hingé mal dikâré ji were jibona heta şeş mehan weré dabeşkirin. Lébelé divé hûn ji xwedîyé malére/mal kirédare henek pere (wek kiré) bidîn. Dibé kû ev şeş meh din weré diréj kirin.

Destûra Parastiné

Dadgeh jibona paristina we dikâré dijé sûçdar tevdéren dinjé bistîné. Dibé kû navan vande tevdére ji zilamé we (yé beré) re qedexe bé kû da

— nekeve maléde

— nîzik malé nebé

— nevé deverén kû hûn gelek caran diçîné (wek cîhé kar, zarokxane ûwd.)

— Bi were bi rîya şaxsî, bi telefon, bi mesajan E-Mail nekevé tekilîyé.

Ev destûrên parastîné bi gelemperî ji demikêre bi sinirin, lê dikârîn bi daxwaznamê werin dirêj kirin.

Ez jibona vé serî li kûdê bidim?

Jibona dayîna standina destûra parastîné, pêwîste kû hûn serî li dadgeha heremî (Amtsgericht) ya kû jibona bajarê we berpîrsîyare, bidîn. Li wan deveran dadgehên malbatê (Familiengerichte) berpîrsîyarin. Dadgeh bi prénsîb bi serilêdane we dikevê tevgerêde. Hûn dikârîn daxwaznama xwe bi rîya parêzerkê, anjî bi xwe serî li cîhê dayîna daxwaznamên hûqûkî (Rechtsantragsstelle) ya dadgeha heremî (Amtsgericht) bidîn. Hekê debara we bi xwe nebé, anjî debara we kémbé, jibona vé mafê we yê standina alîkârîya mesrefa doza dadgehê heye. Gora debara we hûn an jibona wê mesrefan qet nadin, anjî gelek hindik didîn.

Dadgeh çika zû dikârê biryar bidê?

Di rewşên kû şîdet di malêde té jîyan kirin, bi sedema berdeham kirina pêywendîyê, bi piranî xeterik bi berdehamî té holê. Hekê ev rewş hebê, hûn dikârîn destûra parastîné di doza lezginêde bixwazîn. Dadgeh liser daxwaznamek ûsa de di nîzîk 24 seetan de dikevê tevgerê. Dadgeh di vé dozêde dikârê ifada zilamê we (yé berê) nestîné. Bi gelemperî rûnîştina agahdarîya dozê demek paşre pêktê. Jibona dayîna destûra parastîné pêwîste kû hûn rewşa xwe bi bawerdanî bînîn ziman. Jibona wê pêwîste kû hûn zordarî, tehdît û riswakirina ji allîyê zilamê we (yé berê) bi berfirehî û bûyer çawa çebibê, mimkûn bé bi deme û seet rast û bi bawerdanî dîyar bikîn. Çikas ji were zehmet jî bé, vé bikin: Heta ji hewe werê bûyeran biberçav û berfireh dîyar bikin. Başe kû hekê hûn wê dîyarkirina xwe bi beyanek kû şûna beyanek bi sondxarî pêktê, bidîn. Jibona zanîna kû ev beyana şûna beyan bi sondxarî pêktê û bi çî rengî pêwîste, hûn dikârîn ji parêzerkê, anjî ji cîhê dayîna daxwaznamên hûqûkî (Rechtsantragsstelle) ya dadgeha heremî (Amtsgericht) ferm bibîn.

Bi gelemperî bi vé daxwaznamé ev beyana he té pévekirin: „Ez, (pêş- û paşnava we), piştî ez liser cezakirina jibona ifada şaş di ifada beyana bi şûna sondé de hatîm hînkirin, beyan dikim kû, ifada min raste”. Ji bilî vé beyana şûna beyana bi sondxarîyé, başe kû heké we delîl (raporén polîs, şahid, raporén doxtoran anjî wek van) hebin. Xwe li cem parézerké, anjî ji cîhê dayîna daxwaznamén hûqûkî (Rechtsantragsstelle) ya dadgeha heremî (Amtsgericht) agahdar bikin kû, hûn biryara liser daxwaznama xwe çawa bistînîn û wé ev biryar çawa ji zilamé we (yé beré) re bé şandin. Dadgeh, dikâre péşîya biryara parastiné ji zilamé were (yé beré) bişîné, vé biryaré bîné çîh. Bi vî rengî té temîn kirin kû, destûra parastiné di neamadebûna zilamé we jî weré pékanîn.

Heké zilamé min (yé beré) destûra parastiné neyné cîh, çi dibé?

Heké zilamé we destûra parastiné ixlal biké, hûn dikârin – bé xwestinek din ya dozkiriné li dadgehé – icravanek ya dadgehé bi wazîfedar bikîn kû, destûra parastiné dîsa îcra biké. Îcravan dikâre bi alîkârîya polîs dijé zilamé we (yé beré) mûdaxale biké. Ji bilî vé derfeta we heye kû, hûn li cem dadgehé cezayé pera anjî yé hepiskiriné bixwazîn. Heké kesén şîdeté dîkin destûra dadgehé ya parastiné îxlal bikin, xwe sûçdar dîkin. Heké destûra parastiné hatibé ixlal kirin, péwîste kû hûn polîs agahdar bikîn kû, da polîs dijé zilamé we (yé beré) dozîk ya cezakiriné pékbîné.

Polîs û dadmenî dikârin jibo min çi bikin?

Légerîna hawarîyé bi nimra 110

Gava hûn bi zilamé xwere şer bikîn, jibona parastina xwe bi nimra 110 ya hawarîyé bigerin, polîs agahdar bikin û ji vé şerm nekin. Di rewşên acîl yé xeterde wezîfa polîsîye kû, mirov ji şîdeté bi parézé. Polîs berpîrsîyare kû bi sedemé légerîna hawarîyé weré û dikâre péşîya şîdetén din bigré. Polîs di vé rewşéde ji we cûda pîrsa biké û hûn dikârîn rewşé bînin ziman; tiştta kavîmî îzah bikin, agahdarî lîser bîrînin xwe yé belkî ne eşkere tén dîtin, bikin, fersend hebé, navén şahidan bidin.

Jibona kû hûn xwe béxîn di ewlekârîyéde, derfet heye kû, hûn di bin refaketa polîsde cîhé bûyeré terk bikîn, mesele herîn malek ya jinan.

Ji alîyé polîsî ji maldûrkirina kesé şîdeté diké

Heké dijé we û/anjî dijé zarokén we xetera şîdeté dîsa hebé, ji male avetina kesé şîdeté diké, anjî qedexekirina cardin hatina wî ya malé dibé kû heya 14 rojan berdewam biké.

Polîs dikâre kesé kû şîdeté diké ji malé dûr biké, miftén malé jé bistîné û jére cardin hatina malé qedexe biké. Heké dijé we û/anjî dijé zarokén we xetera şîdeté dîsa hebé, ji malé avétina kesé şîdeté biké, anjî qedexekirina cardin hatina wî ya malé dibé kû heya 14 rojan berdewam biké. Polîs ji bilî vé jî dikâre ji zilamé were qedexe biké, da nîzîké we nebé û bi wera nekevê péywendîyade. Ev qedexe dibé kû, deveré kû hûn lé dimînin (wek cîhé karé we) jî pék weré. Heké polîs zilamé we ji malé dûrbiké, hingé we û cîhek yé jibona şewirmendîya jinan agahdar biké. Ev cîhé şewirmendîyé wé bi seré xwe bi were bikevé péywendîyé, ji were alîkârî û piştgirtîyé péşnîyar biké û we lîser derfetén we yén hûqûqî agahdar biké.

110

Nimra légrîna hawaré

**Hûn dikârîn 24 seeta ji vé
nimra hawarîyé alîkârîyé
bixwazîn**

Glî (şikayet)

Şîdeta ji alîyé zilaman dijé Jinan (yén bi zewac) dijé kanûnéye û ev wek birîndarîya laş (ya giran anjî bi xeter), tecawûz, zextkirin anjî tehdîtîkirin dibé sedema cezakininé. Heké hûn bûne maxdûré kiryarek ya cezayî, hingé hûn dikârîn li cem polîsî bi dev glî (şikayeté) bikîn. Kesén din jî, yén kû kiryarén cezayî yén zilamé we dizanin, dikârîn glîyé cezayî bikin. Hûn dikârîn glîyé cezayî rasterast licem dozgervan jî bidîn. Başe kû mirov vé bi nivîs bidé. Di glîde, çi hatibé seré we dîyarbikin. Péwîste kû li wéderé kiryarén bûyîn bi roj, seet, çawa çébûye, weré gûtin, heké şahidé bûyeré hebin, başe kû mirov navén wan û delîlén dinjî, wek rapora doxtor anjî sûretén birîndarîyan dîyar biké. Derfeta we heye kû, hûn brîndarîyan bi rapora tiba hûqûqî bidîn misoger kirin.

Cîhé şewirmendîyé dikârî jibona vé alîkârîya we biké. Heké hûn bixwazîn, hûn dikârîn kesek kû hûn jé bawerîn, bi xwere bibîn cîhé dayîna glîyé.

Piştî glî hat kirin, çi dibê?

Mirov piştî liser bûyerkê glî kir, polis û dozgervan bi dest tehqîkatan dikin. Ev pêşîye her tiştî té mena wê kû, hemû kesên tekilê bûyer bûne, werin gûhdarkirin. Jiber kû bi giranî ji bilî we ti şahidên bûyerê tûne, jibona ifade we ev tiştên he gelik girîngen: Hemû şîdet, lédan û tehdîtên ji alîyê zilamê we ji despêkê péde dîyar bikin. Navê hemî kesên kû bûyer dîtî anjî bihîstî bidin, – ger mûmkinbé – liser birîn (yén berê jî) û encamén wan de raporén doxtar şanî bidin. Tiştên liser bûyeran tén ji bîra we di protokolkêde binivîsin; di vé protokollêde bûyeran bi tavayî (bi roj, dem, şahid), tehdît û şîdetên dinjî not bikin. Belgén we di doza demê péjde wê ji were alîkâr bibin. Raporén polîs yén liser bûyerén bihevçûyînan yén berêjî gelek girîngin.

Paşre liser sûçdarîyan wê ifada zilamê/hevalê we (yé berê) bé standin.

Paşê dozgervan biryar didê kû, çi were kirin. Ev biryar pêşî bi encama tehqîkatan, bi teybetî bi delîlên kû tén dîyarkirin û bi giranîya bûyera cezakirinê vé girêdayîye.

**Tiştên liser
bûyeran tén ji
bîra we di
protokolkêde
binivîsin**

Doza cezayê, ya ji alîyê dozgervan té vekirin

Dozgervan liser rewşên şîdeta di malêde „yé hindik cidîne“ dikârê bûyer bidê kû, da sûçdar tékil bi perwerdek sosyali bibê. Ev li vé derê dikârê férbibê kû, helwesta xwe û kontrola xwe baştîr bikê. Hekê zilamê/hevalê we vé talîmatê bîné cîh, dozgervan dikârê doza cezayî ya dijê zilamê/hevalê we bidê îptal kirin. Hekê zilamê/hevalê vé talîmatê neynê cîh, wê doza cezakirinê werê berdewam kirin.

Hekê doza jibona rewşên giranî yén şîdeta malêde mehkûm-kirina kesê sûçdar ihtîmalek mazinbé, dozgervan îddînamê pêşkêş dikê û piştî wê rûniştinek ya dozê bi dev li dadgeha sûlhê (Amtsgericht) anjî dadgeha Eyaletê (Landgericht), ya

dozén cezayî dinéré, despédiké û wé hûn wek şahid dozéde cîh bigrîn. Ji bilî vé jî derfeta we heye kû, hûn dozgerîya maxdûrîyé bikîn û aktiv tékil dozé bibîn (jibona agahdarîyén liser vé binérin jér). Di rûniştina dozéde ya bi dev péşî ifada hemî şahidan té standin û liser delîlan té axaftin. Dawîyéde dadmend biryareké didé. Wé hûn wek şahid ji rûniştina dozére werîn dawetkirin û bi prensîp divé hûn ifadé bidîn. Tene heké hûn mirov, dergisitî, pîrek anjî pîreka hetî berdan, ya kesé té tewanbarkirin bin, mafé we yé redkirina şahidîye (yanû redkirina ifadedayîné) heye. Hûn bi giranî şahida kû wî kesî tewanbardiké ne, jiber kû şîdet gelek kém caran bi bejdarîya kesén din pékté. Jibona wé jî ifada we jibona tehqîkata cezayî gelek girînge.

Heké dozgervan doze veké, hûn bi giranî dibîn şahidik girîng û hûn dikârîn alîkârîyé bistînin.

Alîkârî pévajoyé

Girînge kû mirov xwe ji dozére amade biké. Gelek jin ji hefdîtina cardin bi kesé té sûçdarkirin, ditirsin. Daxûyankirina kawimîyén bi êş carikdin di atmosferik bi neşexsane û dibin tirséde di rûniştina dadgehéde ji gelek jinanre barek mezine. Hûn ne mecbûrîn kû, vé tene bi seré xwe dîyar bikîn. Jibona véjî ev derfetén kû jér hatîna dîyarkirin hene:

Xwe amadekirina ji pévajoyére û ve refakata di pévajoyéde

Cîhén şewîrmendîya jinan û ya telefona hawarîyé ev gelek salin bi jinén kû şîdet dîtînre hevkarîyé dikin. Ji her jinére alîkârî té kirin kû, da rîya xwe ya şexsî peyda biké. Cîhén şewîrmendîya jinan, wé ji were di rîya wede – kijan rébé jî – alîkâr dibin: Şewîrmendé we jibona hamû pirs û tirsén we wé ji were amadebé û li cem we bé. Ev alîkârî jibona gelek jinan girînge kû, da ew bikârîn demén zext yé

kû dozén téne holé, derbas bikin. Gelek daran zehmete kû mirov bi seré xwe tirs, bîranîyén bi êş û şîkan bikaré tehemûl bike. Şewirmendén hatine perwerdekirin wé bi were derfeta peyda bikin kû, da zexta di navé û ya ji derve weré kém kirin.

Refaketa pévajoyé ya psîkososyal

Derfetik dinjî, bejadarbûna kesek yé şewirmendé psîkososyal li dozéde ye. Ev şiklik yé refaketa bi kesé hatî maxdûrkirin re di demé pévajûya cezayîde bi teybete, lébelé ev ne şewirmendîya hûqûkî dihevíne ne jî xizmeta zelalkirina bûyera sûçî diké. Ev şewirmendîyek belaş û alîkârîyek ya ji dayîna glîyê heta dawîbûna pévajoyé ya ji alîyê kesén zanistvanén van dozaye. Wazîfén jibona van ewen kû, di giştîya pévajoyéde ji were alîkârîyé biké. Ev kes wé ji were révebirîya pévajoyé bi tevayî dîyar biké, we liser maf û erkén we agahdarbiké, refaketa we ya di ifade dayîné biké û di rûniştina bingehî ya dozéde li cem we beşdarbé. Hûn dikârîn mûhatabén jibona vé pêşniyaré yé di herema wede di rûpelén dawî yé vé broşûrede peyda bikîn.



Dozgerîya mûdahilî

Wek maxdûrê hin sûçan mafê we yê dozgerîya mûdahilî heye. Bi vê derfetê hûn dikârîn wek dozgerê mûdahilî bi serê xwe, anjî bi rîya parezerkê aktiv bejdarê doza cezaîfî bibîn.

Hûn dikârîn parêzerkê jibona temsîlkirina doza mûdahilî wazîfedar bikîn. Ev kes wê serîlêdana vekirina doza we ya mûdahilî bikê. Wek dozgerê mûdahilî gelek mafên we hene: Bi nimûne wek bejdarên din yên dozê mafê we yê pirsan heye, wê hûn ji hemû rûniştinên dozê werin dawetî kirin, rûniştin ji gelemperîrê girtîjîbê, hûn dikârîn bejdarê rûniştinê bibîn. Her çikas we serîlêdana vekirina dozê nekîrbê jî, hûn wek mûdahilê dozê bi selahîyetî, xwedîyê wî mafîne. Parêzerê we dikârê dosya dozê binêrê, yanû hûn fêrdibîn kû, tehqîqat liser çî hatîye kirin û wê di rûniştinêde çî werê gûftûkirin. Parêzger gava hûn wek şahid di rûniştinêde îfadê bidîn, we bi parêzê û ji werê âlîkârbê; dikârê daxwaznamên liser delîlan bidê û talîmat û pirsên kesê din red bikê.

Di hin rewşande mesrefên dozgerîya mûdahilî dikârîn ji alîyê dewletê werê dayîn. Ev dibê kû wek nimûne ji maxdûrên cinselîyê re werê kirin. Hekê debarê we hindêkbê, anjî qet nebê, wê hingê ji were jibona mesrefên dadgehê alîkârî bê kirin.

**Wek dozgerê
mûdahilî, gelek
mafên we hene.**

Kârmendén tendûrîstîyé dikârin jibo min çi bikin?



Şîdet herdem zirarê didê tendûrîstîya maxdûran. Bandora şîdeta té dîtî ji birînén eşkere, wek ji şkandinan hestûyan, warmandinan, birînén teqîn û kûr, heya bêxewnî, nexwarin, êşên nayên dîtî wek depresiyon, tirs, êşên nerehetîyên posttravman berfireh dibê. Hema hemû maxdûr talîyé rojekê mecbûr dibin kû biçin doxtor, anjî sazîk din ya tendûrîstîyé. Bé gûman tedavîya birînén acîl pêşîya her tiştî té. Jibona kû tedavî herî baş weré kirin, başê kû hûn ji doxtor, kârmendé tedavîyé, anjî belkû dermanxanére dîyar bikin kû, ev birîn ji kûdê tén. Ji pêşîya hertiştî pêwîste kû, rewşa we ciddî weré standin û zext liser we newin kirin. Doxtor wê pirsgireka we çareser nekê, lé belê dikâré ji were alîkârîyé pêşnîyar bikê.

Belgekirina encama birîndarîyê bi lezginî û gora rastîyan

Universitätsklinikum Schleswig-Holstein (UKSH)

— Cîh, Kiel: 0431-500 15901

— Cîh, Lübeck: 0451-500 15951

Universitätsklinikum Eppendorf (UKE)

— Cîh, Hamburg: 040-7410 52127

Belgekirina birînan

Licem tedavîk hesas û nêrinek terapîk gora encamek baş kârmendên tendûrîstîyê dikârin alîkârîk din ya girîng pêk bînin; ew dikârin birînan belge bikin. Ev belgekirne he agahdarîyên liser bûyerê didê kontrol kirin. Ev dikâre jibona pêkhatina cezaî (glî) lé jibona doza sivîlre jî (jibona tazmînat, peré zirarê) girîngbê û helwesta we bi hêz dikê. Jibona vé jî belgekirina bi tevayî ya birînen we dikâre jibona doza dadgehê, anjî jibona dîyarkirina licem maqaman di çerçewa zagona rûniştinê girîngbê. Hekê hûn bixwazîn glîyê kesê kû bûyera şîdetê li we kirî bikîn, ev belge jibona dozê ya dadgehê wek delîlek bi qeç çêdibê. Jibona vé jî gelek girînge kû, birîn di demik nîzîk û gora rastîyan weré îspat kirin û mimkîn bé sûratên wan weré kişandin. Di van rewşande heya niha bi gelemperî hewla raporên doxtoran té kirin. Lé belê doxtor bi hin sedeman herdem vé nikarin bikîn. Jibona vé jî derfet heye kû, mirov vé belgekirinê di tipxana adlî de bidê çêkirin:

Ev derfet di Klînîkên Zaningehe (Universitätskliniken) Schleswig-Holstein û Eppendorf'ê hene. Li van deran doxtorên pîspor yén bi teybetî birînen di encama şîdeta çêbûye belge dikin û delîlan diparêzin, dixebitin. Ev encama té destkirin, jibona doza dadgehê dibê bingeh. Hûn dikârî xwe di van Klînîkande bépere bidîn mûaynekirin û delîlan jibona belgekirinê bidîn parêzkirin. Jibona vé divê hûn demik kûrtde randevûkê bistînin (binêrin rûpela 27). Doxtorên tipxana adlî jî girêdayê sirveşartina pizîşkîne

Hûn dikârî di sazîyên tipxana adlî ya Universitätsklinikum Schleswig-Holstein, anjî Universitätsklinikum Eppendorf'ê xwe bépere bidîn mûaynekirin û delîlan jibona dadgehê bi ewlehî bidîn belgekirin. Jibona vé jî di demik zûde randevûkê bistînin.

û bé daxwazîye ne polîs agahdar dikin, ne jî delîlên destê xwede didin derik din. Doxtoré we tedawî dikê dikâré jibona we tekilîyê bi tipxana adlîre çêké.

Parazkirina ewlekârî ya delîlan

Ji gelek jinanre heman piştî bûyaré dayîna biryarik jibona, anjî dijê glîyê cezaî zehmeté.

Belkû jî di wî demîde ev ji were ne gelek girîng té. Lé belé dibé kû ev xwe mehên péjde bigûharé. Lé belé teşhîsek baş û belgekirina birînan mirov nikâré paşre çêké. Da kû mirov vé demé péjde bikâré pékbîné, girînge kû, şûpén bûyeré piştî bûyeré heman demik kûrtde jibona îspatkiriné di doza dadgehêde ewlekâr biké. Ev derfet bi rîya ewlekârîya şûpan ya **nepenîyê** dîsa Klînikén Zaningeha (Universitätsklinik) Schleswig- Holstein û Eppendorf'e pék té. Jibona vé demik kurtde randevûké bistînin. Ev mûayne û ewlekirina delîlan jibona we bé pereye û kârmendén tipxana adlî girêdayé sirveşartina pizîşkînéne.

Ezé li kûderé rûnim?

Mala jinan

Heké hûn heman jiber şîdeta zilamé/hevalé xwe mecbûrbîn birevîn, hûn dikârîn bi cerbînîn li cem hevalén xwe yén jin, hevalén kêr, mirovén xwe bimînîn, anjî serî li malek ya jinan bidîn. Hûn dikârîn şev û roj bigijîn malén jinan, nîmrén telefona wan ya li de herama wede di rûpélén dawîya vé broşûrêde hene.

Edresén van malen jibona ewlekârîya jinan nayé eşkere kirin. Heké hûn telefoné bidîn wêderé û li wêderé cîhek vale hebé, wé hingé cîhek yé hevdu dîtiné ji weré bé dîyarkirin. Heké cîhek vale nebé, hûn dikârîn nimra telefona malén jinan yén li derdûrê bixwazîn. Jin dikârîn li mala jinan bi zarokén xwere bimînîn. Hûn li wêderé bi jinén dinre tén cem hevdu û jîyana xwe bi wanre réve bibîn. Li wêderé xebatkâren zana wé ji were şewirmendî û alîkârîyé bikin. Hûn dikârîn hemî kêrén xwe li wêderé pék dibîn; herîn kêr, heké jiwere ewlekârbé, hûn dikârîn çûna zarokén we ya dibistané û baxçé zarokan (KITA) ji wêderé pék bînîn.

Mala hevbeş

Ji gelek jinanre, teybetî jî jinén bi zarok, çareserîya herî baş ewe kû, zilamé şîdeté diké ji mala hevbeş terk biké. Lé belé gelek hindêk bûyervanén sûçdar vé tişté dikin. Derfeta we heye kû, hûn bi daxwaznameké serî li dadgehé bidin û talep bikîn kû da zilamé we ji mala, ya hûn bi hewre téde dimînîn, terk biké. Ev pévajo wé çawa bimeşé û péwîste hûn bala xwe bidîn çî, hûn dikârîn di rûpela 16. ya vé broşûrêde bixwînîn.

Mala nû

Jibona kû hûn ji xwere (û zarokên xwere) malek nû peyda bikîn, ev derfetên cûda hene:

- Serî li maqama mala (Wohnungsamt) bidin
- Hekê pêwîstbê nama mafdarîya rûniştina xanî (Wohnberechtigungsschein) bixwazin
- Di rojnamande xanî bigerin, hûn bi xwe dikârîn légerîna xanî bidîn rojnamé (jibona parastina we başe kû, hûn vé bi şîfrekê dîyar bikîn)
- Kesé kû hûn ji wan bawerîn, liser légerîna xanî agahdar bikin
- Hûn dikârîn seri li simsarén xanîya (Makler) jî bidîn

Di hin şartande Jobcenter / Sozialamt mesrefên malbarkiriné, depizito û/anjî peré simsaré malé didé. Xwe péşî liser pirsá, gelo di rewşa wede ev alîkârî té dayîn ane, agahdar bikin. Pêwîste hûn bûhayé kiré û meznayîya xanî bidîn berçav.

Kelemkirina dayîna agahdarîyan

Dibé kû jbona parastina we, edresa xanîyé we yé nû veşartî bimîné. Jibona vé hûn dikârîn ji maqama nifûsê (Einwohnermeldeamt) anjî maqama welatîyan (Bürgerbüro des Stadtteils), ya herema hûn téde dirûnîn, (di pirtûka telefonande bi kelîma Stadtverwaltung binérin) kelemkirina dayîna agahdarîyan bixwazîn. Divé hûn, hekê edresa we weré eşkerekirin, bidîn bawerkirin kû, xeterî jibo jîyan, tendûrîstî anjî azadîya we ya şexsî (û/anjî ya zarokên we) çédibé. Hûn dikârîn beyana kû wek ya bi sûndxarîyé bi vé daxwaznamé ve bikîn. Hingé maqama nifûsê (Einwohnermeldeamt) nikaré edresa we bidé kesén din. Bidin berçav kû, péşîya demé kelemkiriné dawî bibé, girînge kû ew weré diréj kirin. Ev daxwaznamén wiha jibona maqamén fermî, sazî û parezgeran pék nawé. Jibona vé jî pêwîste kû hûn di her rewşa nû de agahdar bikîn kû, hûn veşartina edresa xwe dixwazîn.

Ezé xwe bi çi xwedî bikim?

Gelek zîlam zexta li jinên xwe dikin û vé îdîa dikin: „tû nikârî tiştê ji min bistînin“ anjî „jixwe tiştê yê te tûne û tû tiştê jî nastînin“. Jibona pûçkirina van agahdarîyên şaş, emé ji were bi kûrtasî gelek derfetên ji hevdû cûda pêşkêş bikin. Jinên kû zarokên xwe bi seré xwe xwedî dikin, gelek caran nikârîn debaré malé bi tene bi héza xwe pék bînin. Zelal bikin kû, jibona rewşa we çi derfet hene. Şewirmendîk anjî alîkârîyek şaxsî ji alîyê cihé şewirmendîyê, anjî parezgerké gelek caran tiştê başe.

Debara xwe

Jibona jinên kû xwedîyê debarekéne (peré békârî I= ALG I bistînin jî) péşî ti gûhartin çénabé. Péwîste kû hûn bi mi-sogeri xwedîyê hisabek ya banké bîn û ji kârdané xwe anjî sazîya berpîrsîyaré ALG I ye bixwazin kû, da peré we li vé hisabé weré şandin. Péşîya hûn sinfa xerca xwe (Steuer-klasse) bigûhrîn, xwe li ser vé tişté agahdar bikin. Heké debara we hindêk bé, başé kû hûn serî li dayîna alîkârîya kiré û/anjî pédana âlîkârîya zarokan ya zéde bidîn.

Nafaqa jibona jinên zewicîn

Nafaqa ji jinên zewicîre, navbera dayîna nafaqa di demé cûdabûné û piştî hevdû berdané de cûdabûn heye.

